Ger hûn bi rastî jî bi vî awayî bi Xwedê re biaxifin, ew dê her tim bi we re be. Dê aramî û bextewarî jiyana we dagire.

Ger hûn bixwazin di derheqê Îsa Mesîh de hîn jî bi zêdeyî agahiyê bistînin, ji kerema xwe ji navnîşana me, ya ku li jêr e re nameyê binivîsînin. Em ê bêyî berdêl ji we re pîrtûkek û Mizgîniyê bişînin.

Em dê bi nameya we kêfxweş bibin. Bila bereketa Xwedê li ser we be.

Navnîşana me ev e:
Hoffnung und Leben e. V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Kurdisch (Es gibt nur einen Weg zur Errettung)



# ROJ BAŞ
# HÛN Bİ XÊR HATİN

Zilamekî ciwan, diçe serîdanka dewlemendekî navdar û çend pirsan jê dipirse. Dema tên dawiya axaftinê zilamê ciwan vê gotinê dibêje: "Li gor fikrê min tu tiştek li vê dinê nemaye ku hûn daxwazya wê bikin." Dewlemend hema bersiva wî dide: "Begê ciwan, tu rastiyê dibêjî, lê belê min bi dilxweşiyê ji her tiştî hinekî din dixwest."

Bona ku em bijîn hewcedariya pere heye. Divê xwarin, kinc û xanî jî kêm nebe. Lê hemûyên van tiştan jî jiyanek bextewar peyda nakin.

## Ka Hûnê Çawa Bikaribin Bextewar Bibin?

Di Kitêba Pîroz de Îsa Mesîh vê gotinê got: "Ez bona ku di mirovan de jiyan hebe, gellekî jiyan hebe hatim." Bi vî awayî, Xwedê hezkirina xwe nîşanî me da. Lê belê ji bo çiye ewqas kes vê jiyanê nas nakin?

## Mirov Ji Xwedê Veqetiyaye!

Hinek kes li dijî Xwedê radibin, hinek kes jî bi zêdeyî têkilî pê naynin. Xwedê dibêje ku hemû van kirinan guneh in. Mirov bona ku bi oldarî û jiyanekî qenc bijîn, bona ku nêzîkî Xwedê bibin dixebitin. Lê belê ji ber ku hemû van tahb û xebatan vala ne, mirov nikarin bigihêjin armanca jiyanê.

## Tenê Rêyek Xelasiyê Heye:

Îsa Mesîh li ser xaçê ji bo gunehê we bû qurban! Bi vî awayî, bi berxikbûna xweyî qurbanê, li dêvila we cezayê gunehên we wî kişand. Û paşî mirina xwe, di roja sêwemîn de vejiya. Îsa Mesîh îroj dijî û ji we hez dike! Îsa Mesîh rêya jiyana abadîn e.

## Ger Hûn Tenê Bi Van Rastiyan Bizanibin Qîm Nake.

Divê hûn bi xwe Îsa Mesîh qebûl bikin û daxwaziyê bikin ku bila bikeve jiyana we. Baweriya ku Xwedê li bendê ye ev e. Ji ber ku wî wusa gotiye: "**Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Mesîhê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe."** Ji Kitêba Pîroz

## Niha Hûn dikarin Gava ku Di Jiyana We de Herî Girîng e Bavêjin.

Hûn dikarin bi vî awayî bi Xwedê re biaxifin û dua bikin: "Ya Xelaskerê min Îsa Mesîh; heta vî demê min bêyî te jiyana xwe buhurand û li dijî te guneh kirim. Li gunehê min biborîne û bibe rêvebirê jiyana min û min li gor xwesteka xwe biguherîne. Amîn."